

Ramana Dr. Qasimlo der-heq pirsa serxwebûna Kurdistanê di dîrokê de

»»»» R:6

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (310) 22-09-2017 Buha (1000) Tûmen

Mistefa Hicrî: Tekoşîna Dr. Şerefkendî dikarî kêşeyeke mezin bo rejîma Îranê pêk bîne, lewra biryara jinavbirina wî dan



Rêvîngên rêya Şerefkendî yad û bîra wî bilind ragirtin. Roja 26`ê Xermananê, rêûresma 25.mîn salvegera şehîdkirina Dr. Şerefkendî û hevalên wî, li binkeya Deftera Siyasî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, di bajarê Koyê de bi rê ve çû.

»»»» Dom R:2

Referandoma Serxwebûnê vejiyandina Komara Kurdistanê ye



»»»» Nûçeya manşêtê li R:8

Sergotar

Dewleta Kurdistanê, kiyanek ji bo jiyaneke serbest

N: Kerîm Perwîzî

Referandoma Herêma Kurdistanê ku biryar e roja 25`ê Îlonê bi rê ve bibin, pêngaveke dîrokî ya Kurdistana Başûr e, bona nêzîkbûna bi hêviyeke mêjîn ya Kurd, û cardin avakirina kiyaneke neteweyî, ku piştî Komara Kurdistanê û ezmûna Herêma Kurdistanê, hem dirêjîderê vê riyê ye, û hem jî vegeşandina rewta mafxwaziya civakê ye, ku serbarê hemû astengiyên dîrokî, û stratejîk û navçeyî, qonqxeke girîng û bingehîn dibire, û êdî ji niha şûnda pirtûkên dîrokî rûpelên niha bi dawî tînin, û rûpeleke din ya nû dest pê dike.

Referandom û rapirsî ji xelkê herêmekê bona vê ku li ber çavê hemû cîhanê, bizanin ku ew xelk çi dixwaze, û ji vî xelk û civakê pirs tê kirin bona diyarîkirina mafê qederê, ew yek diyardeyeke demokratîk û serdemiyane ye, û rêzgirtin e ji vîna civakê û hevdem şêwazeke modern û serdemiyane û aştîxwazane ye, bona dengbilindkirina neteweyekê.

Di dîrokê de, û niha, û di pêşerojê de jî, bona vê ku netewe û gelên cîhanê boçûnên xwe bînin ziman, rê ji wan hatiye girtin, û tê girtin, û gellek caran neçar kirine û dikin jî, ku hawara xwe bibin ber şêwazên tundûtîj, bi eşkerekirina dengê xwe, û selimandina îradeya xwe. Lê referandoma şêwaza herî aştîxwazane ye ku tenê dagîrker û tawankar dijberiya wê dikin, û Komara sêdarê ya Îslamî ya Îranê ye, ku bi rohnî û bi ew qasê şermê ve, li dijî rapirsiyê sekinî ye, û gefan li wan dixwe.

Cuda ji referandomê bixwe, encama vê referandomê hilgirê watayeke girîng e, û hêzên siyasî berev çinîna vê encamê hewl didin, ku ew yek cihê girîngî pê danê ye, ew jî serxwebûna neteweyekê û jidayîkbûna kiyaneke nû, û avakirina vê dewletê ku di nava neteweyên cîhanê de, serek bi seran zêde dibe.

Serexwebûna Kurdistana Başûr û avakirina dewleta Kurdistanê di vê para nîştiman de, bilindkirina îradeyeke mafxwazane û hogiriya bo serbestî

»»»» Doma R:1

Roja Yekşemî 26`ê Xermananê rêûresma salvegera terorkirina Dr. Şerefkendî û hevalên wî bi amadebûna endamên rêberî û kadr û pêşmerge û malbatên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û herwiha çendîn partî û aliyên siyasî di binkeya Deftera Siyasî a Partiya Demokrat li bajarê Koyê bi rê ve çû.

Ev rêûresma bi sirûda neteweyî a "Ey Reqîb" û deqeyek bêdengî ji bo rêzgirtin ji riha paqij a şehîdên rêya azadiya Kurdistanê dest pê kir. Piştre peyama Deftera Siyasî a PDKÎ bi boneya 25.mîn salvegera şehîdkirina Dr. Şerefkendî û hevalên wî , ji aliyê "Mistefa Hicrî" sekreterê giştî yê PDKÎ ve, hat pêşkêşkirin.

Sekreterê giştî ê Partiya Demokrat di axavtina xwe de, got ku dosiya dadgeha "Mîkonos"ê, di yekem halet de, rêberên rejîma Îranê, weke encamderên wê terorê da naskirin, her



ev cezaya Dadgehê jî bû sedem da ku destê rejîma Îranê, di domandina kiryarên xwe ên terorîstî de kurt bike, herwiha serokê Dadgehê îşare bi vê yekê kir ku terora "Viyanê" jî her weke terora Berlînê bûye. Hicrî herwiha bas ji vê yekê kir ku, herçend ku berpirsên rejîma Îranê, givaş xistine ser birêveberên vê dadgehê, da ku dest ji encamdana vê dosiyê hilgirin, lê dadgeha "Mikonos"ê rûyê rast yê rejîma Îranê, di dosiyê de, nîşanî dinyayê da. Sekreterê giştî yê Partiya Demokrat, di doma axavtinên xwe de bas ji vê kir ku, hekî dosiya kiryara terorîstî a Viyanê, ji aliyê welatê Utrîşê ve bidûreçûn bihatiba kirin, Dr. Şerefkendî û hevalên wî, nedihatin terorkirin. Mistefa Hicrî bas ji vê yekê jî kir ku, Dr. Sadiq Şerefkendî di malbateke hejar de hatibû dinê, û tevî hemû kêmasiyên jiyanê karîbû pileya bilind di asta zanistî de, bi dest bixe, û di zanîngeha Parîsê de dersê bide, û piştre tevlî refên pêşmergeyan be, û ji ber jêhatîbûna xwe, bibe rêber û şoreşgerekî rasteqîne. Sekreterê giştî yê Partiya Demokrat di dawiya axavtinên xwe de, bas ji referandoma serbixweyiya Kurdistana Başûr kir, û got: ''Ev helwêsta neteweyî mafê hemû gelên diniyayê ye, ku yek ji wan neteweyan Kurd e,û herwiha diyarêkirina mafê çarenivîsê yek ji armancên PDKÎ ye, û em jî bi hemû hêz û şiyana xwe piştevaniyê ji referandoma serxwebûna Kurdistanê û her encameke wê dikin''. Piştre sirûdek bi navê "Sadiq Şerefkendî" ji aliyê zarokên navenda ''Nêrgiz'' ve pêşkêşî beşdarên rêûresmê hate kirin. Di beşeke din ya vê rêûresmê de, sirûdeke din a bi navê "Rêberê min" ji vehûnandina "Umer Xulam`elî" ji aliyê koma mozîkê ya Partiya Demokrat ve hat pêşkêşkirin. Piştre peyama hevpar a yekîtiyên jinan , Xwendekaran û Ciwanên PDKÎ, ji aliyê "Emîn Îbrahîmî" berpirsê birêveberiya Yekîtiya Ciwanan ve hate pêşkêşkirin.Herwiha bi munasibeta 25.mîn salvegera şehîdên Birlînê biroşorek derheqê jiyannameya Dr. Şerefkendî û hevlên wî hate belavkirin. Di dawiya rêûresmê de, sirûdeke şoreşvanî a bi navê "Şîpela şîn" ji vehûnandina "Selam Îsmaîlpûr" ji aliyê koma mozîk ya hizbê ve pêşkêşî beşdarên rêûresmê hate kirin. Herwiha çendîn partî û aliyên siyasî yên herçar parçên Kurdistanê, di vê rêûresimê de beşdar bûn, ku ev partiyane bûn:

-Yekîtiya Niştîmanî a Kurdistan
-Partiya Demokrat a Kurdistan
-Hizba Şiyû`î
-Yekgirtûya Îslamî a Kurdistanê
-Hak-Par (Partiya Maf û Azadiyê)

Herwiha "Kemal Burkay" kesayetiyê siyasî yê Bakûrê Kurdistanê jî, di vê rêûresmê de beşdar bû. Hêjayî basê ye ku cuda ji vê rêûresmê, di gellek welatên Ewropayî de jî, rêûresm û semînar bi vê boneyê ve pêk hatin. Di navxwe ya Kurdistanê de jî, gellek çalakî bona mehkûmkirina vê terorê pêk hatin, û endam û alîgirên PDKÎ serbarê rewşa tund ya ewlekariyê diruşmên pêwendîdar bi vê boneyê nivîsandin, û gellek tirakt belav kirin.

Deqa axavtinên Mistefa Hicrî di rûpela 4ê de hatiye danîn.

û rizgariyê ye, ku xelkek bi navê neteweya kurd û civaka Kurdistanê piştî sedan salî bindestiyê û serkutkirinê, û zewtkirina hemû mafan û cewherîbûnê û têkdana nasnameya takekesan, cardin têne nava dîrokê de, û rê nadin êdî stratejî û siyaset û dîrok û jiyan, bi bêy wan bê nivîsandin, êdî Kurdisatan jî, aliyê kêm di beşekê de, wekî biker û xwedî xewneke piratîk di nava hevsengî û nahevsengiyê de bi rola xwe radibe, û ji dûr ve mêze nake, ku bizane çi jê re dinivîsin.

Renge astengî û kêmasiyên siyasî ên Kurdistana Başûr û ezmûna 25 salên borî a hikûmetdariyê di vê beşê de, wisa li hinek kesan bike, ku bîr ji kêşeyên piştî serbixweyiyê bikin, û nîgeran bin, lê baştirkirin û hewldan bo vegeşiyan û dijberiya gendeliyê û guherînkariya siyasî û aborî û civakî, piroseyeke dûr û dirêj dibe, û reform û guherînkarî di hemû neteweyan de wê demê pêngaveke qurs û qahîm jê re hatiye hilgirtin, û vegeriyana bo paşve tê de nebûye, ku di nava kiyaneke serbixwe de were cîbicîkirin. Bi vê wateyê ku renge dewleta serbixwe, ji xwe nebe sedema dadperwerî û çaksaziyê, lê bi bê dewlet û kiyaneke rizgarkirî hemû pêngavek di biyavê reform û azadîxwaziyê egera vegeriyana bo paşve tê de heye.

Kiyana serbixwe xala komkerê hemû berjewendiyan dibe, û hemû hêvî dikarin tê de bêne komkirin, û di rastî de avakirina avahiyeke bilind û qahîm dibe, ku deng û rengên cuda tê de deng vedin, lê deng û rengeke harmonîkkirî ku bibe orkestrayeke xweş, û govendeke hevaheng ya rengan, ne eva ku têkelbûneke nehêja ya hemû deng û rengekê be, ku bedela tamwergirtinê, janê bibexşin. Dewleta serbixwe ya Kurdisatanê li Başûr ku xaka tazevegeriyayî bo himbêza nîştiman bi xwe digre, hem formbexşîn û avakirina bingeheke neteweyî ye, û hem jî pêngaveke girîng ya dîrokî ye, ku renge niha nehê kirin ku bi zelalî û bi kûrahiya rewşa heyî tam û rengên wê bêne dîtin, lê her hinde ku dijminên Kurd û bi taybetî Komara Îslamî gellek pê nerehet in, û hemû gefekê lê dixwin, û hejmarek bi nav rewşenbîrên Fars lê di rastî de reşbîr û faşîst, ku dirêjiya Komara Îslamî ne, jê tirsiyayî ne, ew yek îşare ye bi heqîqeta dewleta serbixwe ya Kurdistanê.

Bi gotineke din hekî tu nezanî ku pêngavên te çiqas girîng in, ji rûçikê dijmin ve bizane, ku çiqas jê nîgeran in!.

www.rasiv

Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ serdana Hêza Taybet kir



Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ di hevdîtineke sê rojî de, digel fermande û pêşmergeyên Hêza Taybet kom bû.

Nûçegihanê malpera Kurdistanmedia ji binkeya Hêza Taybet ya PDKÎ ragehand ku rojên 21-23`ê Xermanana 1396`an ya Rojî sekreterê giştî ê PDKÎ serdana Hêza Taybet li ser sînorê Rojhilat û Başûra Kurdistanê kir.

Nûçegihanê malpera Kurdistanmedia bas ji vê kir ku Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ bi hûrî guh da rexne û pêşniyarên pêşmergeyan di binkeyên Hêza Tyabet de, û di doma vê serdana çend rojî de, paş bidawîhatina rexne û pêşniyarên pêşmergeyan çend bas pêşkêş kirin.

Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ di vê civînê de, îşare bi dagîrkar bi dirêjahiya dîrokê û bi taybetî piştî parvebûna Kurdistanê li şerê cîhanî ê yekem de kir ku wan rejîman hewla helandin û jinavbirina nasnameya neteweyî ya Kurd dane, bo vê yekê jî dest bo hemû cure çewsandinekê birine, ji ferq û cudahîdanînê ve bigre heya dûrxistin û fermana cîhadê û komkujî û îdam û zîndanî û milîtarîzekirina Kurdistanê û bêdengkirina dengê azadî û ragirtina Kurdistanê di hejarî û derbiderdiyê de.

Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ ragehand ku hebûna we li vir de, cihê şanaziya hemû gelê Kurd e, û hûn xortên herî baş ên vê neteweyê ne, û hûn bergiriyê ji daxwazên xwe ên neteweyî bo jiyaneke azad û serdemiyane dikin. Hebûna we li vir garantiya mana gelê me ye, û xatircem bin ku emê serkevin bi ser dijmin de, jiber ku xebata me xebateke rewa ye.

Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ herwisa rû li fermandarên Hêza Taybet ragehand ku hûn dibe vê yekê jî bizanin ku xebat bo rizgariya neteweya me li dijî rejîmên dîktator ên navend, bêhnfirehiyê dixwaze, û xatircem bin ku pêşeroj ya me ye, û em hemû palpiştê hevdu ne, em hemû pêşmerge ne, û pêşeroj her ya me ye, lewra em daxwazê ji we dikin ku bi awayekî micid kar bikin, bona xwepêgehandinê.

Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ herwisa bas ji vê kiriye ku wekî PDKÎ hemû cure hêsankariyek me ji bo we kiriye, lewra jî ez daxwazê ji we dikim ku bi awayekî micid hewla xwepêgehandinê bidin, û her daxwazeke we hebû, bi kadr û berpirsyarên xwe ragehînin û pileyên serkevtinê bibirin û têkevin nava serkirdayetiya hizbê, xebata me xebateke rewa ye, xebat bo azadî û rizgariya neteweyekê ye ku bi dirêjahiya dîroka dagîrkar, û bi derba çek û kuştin û piştgihxistin û dûrxistinê hewla jinavbirina wê hatiye dayîn, lê nekariye, jiber ku vê neteweyê pêşmergên qehreman hene. Herwisa Mistefa Hicrî bas ji vê kir ku hûn nûnertiya îradeya neteweya me dikin.

Amadebûna we di vir de, vê rastiyê nîşan dide ku we hest bi azara gelê xwe kiriye, lewra niha çeka pîroz ya pêşmerge we hilgirtiye, bona bergirî ji gelê xwe, ji bo bidestxistina van mafên rewa, û şoreş ji bo azadî û demokrasî, û şoreş bo mana neteweya Kurd, we hest bi vê zulm û zordariya dagîrker kiriye, û we serî hildaye bo bidestveanîna mafê neteweyî, hûn hemû xortê vê neteweyê ne, û çavê hêviyê yê neteweya Kurd li we ye.

PDKÎ û HAK-PAR`ê, pirsa referandoma Kurdistanê gotûbêj kirin



Heyeteke HAK-PAR`ê serdana ofîsa nûneratiya PDKÎ li Hewlêrê kir, û derheq pirsa referandoma Herêma Kurdistanê gotûbêj kirin.

Roja Sêşemiyê 21`ê Xermanana sala 1396 (12.09.2017)`an, heyeteke HAK-PAR`ê bi serperestiya Zana Sezen nûnerê HAK-PAR`ê li Herêma Kurdistanê serdana deftera nûnertiya PDKÎ li Hewlêrê kir, û ji aliyê heyeteke nûneratiya PDKÎ bi serperestiya Mihemedsalih Qadirî berpirsê ofîsa nûneratiya PDKÎ li Hewlêrê pêşwazî ji wan hate kirin.

Di vê hevdîtinê de, Mihemedsalih Qadirî tevî baskirina ji helwesta PDKÎ derheq referandomê ji bo serxwebûna Kurdistanê, wekî erkeke neteweyî û nîştimanî, helwest û pêngavên PDKÎ bona palpiştîkirin ji Herêma Kurdistanê, û hevsoziya aliyên siyasî ên beşên din ên Kurdistanê, bo serxistina vê biryara dîrokî a Başûra Kurdistanê bi girîng zanî, û ragehand ku pêwîst e li hemberî egera her pîlaneke rejîma Îranê û neyarên referandomê, hemû aliyên Kurdistanî alîkarê Herêma Kurdistanê bin, û ew yek erkeke nîştimanî û neteweyî ye.

Piştre Zana Sezen, tevî hevhelwestî û piştevaniya ji pêngavên PDKÎ derheq referandomê, û çalakiya PDKÎ li Rojhilata Kurdistanê, pêdagirî li ser palpiştî û hevhelwestiya HAK-PAR`ê û xelkê Bakûra Kurdistanê ji referandoma Herêma Kurdistanê kir, û ew helwesta neteweyî û nîştimanî ya PDKÎ û xelkê Rojhilata Kurdistanê ji bo piştgiriya ji referandoma Başûra Kurdistanê, girîng hesiband.

Di dawiyê de herdu aliyan pêdagirî li ser berdewamiya pêwendî û alîkariya di navbera xwe de kirin.

Bavê pêşmergeyekî PDKÎ koça dawiyê kir



Kurdistanmedia: Kak Baram Îbrahîmî bavê pêşmergeyekî PDKÎ li bajarê Kamyaranê koça dawiyê kir.

Li gora nûçeya gihîştî bi malpera Kurdistanmedia, roja Sêşemiyê 28`ê Xermananê kak Baram Îbrahîmî xelkê gundê Textî Zengî a ser bi Kamyaranê jidayîkbûyê sala 1312`an di temenê 84 saliyê de koça dawiyê kir.

Navbirî bavê Setar Îbrahîmî pêşmergê PDKÎ ye, ku bi salan e di refa pêşmergeyên PDKÎ de xebatê dike. Kak Baram kesayetiyekî xweşnav, û cihê baweriya xelkê navçê bû, û termê navbirî di nava girseya xelkê navçê de bi axê hate spartin.

PDKÎ sersaxiyê dibêje malbat û xizm û kesûkarê navbirî, û xwe şirîkê xema wan dizane.

Deqa axavtina Kak Mistefa Hicrî sekreterê giştî yê PDKÎ di rêûresma bîranîna 25.mîn salvegera terorkirina Dr. Şerefkendî û hevalên wî de



Ji vê rojê ve ku di 17`ê Îlona 1992 (26`ê Xermanana sala 1371)`an de, kesayetiyê naskirî û sekreterê giştî ê PDKÎ Dr. şerefkendî naskirî bi Dr. Se`îd, digel kak Homayon Erdelan û kak Fetah Ebdulî û kak Nûrî Dêhkurdî hatin şehîdkirin, 25 sal derbaz dibin.

Em wekî hemû salekê îro jî li vir kom bûne, da ku ji aliyekî ve cardin rêz û hurmetê danên bo rêbaza xebatkarane ya van şehîdên xwe ên şoreşger, û silavan dişînin bo riha wan ya pak, û bi vî rengî emegdariya xwe wekî hevrê û hevçeperê wan, nîşan bidin, û serê rêz û hurmetê li hemberî rêbaza wan ya pîroz de bitewînin, û ji aliyekî din ve rejîma teror û sêdarê ya Komara ÎSlamiya Îranê mehkûm bikin, derheq vê tawana mezin de, ku derheq sekreterê wê demê yê PDKÎ Dr. şerefkendî û hevalên wî û hemû gelê Kurd kirin.

Li 17`ê Îlona 1992`an di dema şevê de, Dr. şerefkendî û hevalên wî li bajarê Birlînê di restoranekê de bi navê Mîkonos, digel komek ji endamên çend rêkxirawên dijberî Îranê bona gotûbêjê li ser çawaniya lihevnêzîbûn û pêkanîna hevdengiya zêdetir di navbera xwe de û bi mebesta xebata hevpar li dijî rejîma Îranê kom bûn ku li demjimêr nêzî 11`ê şevê, çekdarek ku piştî lêkolîna polîs eşkere dibe, ku ew Ebdulrehman Benî Haşimî berpirsê tîma terorê bûye, êrîşî ser wan dike,û bi diyarîkirî Kurdan dike armanca gulleyên xwe, û kesekî din jî, tîra xilasê li wan dixe, û bi vî awayî Dr. şerefkendî û hevalên wî û Nûrî Dêhkordî şehîd dibin.
Di tîma vê terorê de, Îranî û endamên Hizbullaha Lubnan û endamekî eslî yê Şî`e yê Lubnanê pêkve pilanê bi rê ve dibin, ku her hemû jî di Îranê de û li jêr çavdêriya Spaha Pasdaran û rêkxirawa Îtila`atê de hatine perwerdekirin.

Piştî nêzîk bi du salan lêkolînê û şopandina polîs û dezgeha Dad ya Almanyayê, roja 10`ê Nîsana 1997`an de, dezgeha Dad ya Almanyayê hukmê xwe ragehand, û tê de ji bilî diyarîkirina cezayê bo 5 tawanbarên ku di terorê de dest hebûn, hukmê girtinê ji 5 salan ve heya girtina ebed bo wan birîn. Serokê dadgehê herwisa ragehand ku erk û wezîfeya me ye, ji bona eşkerebûna vê kuştraê, em bêne ser baskirina ji wan sedeman, ku bûne sedema pêkanîna vê kuştarê. Ya ku dixwazim di vir de bixwînim çend beşên kurt ji axavtinên serokê dadgehê ne, ku di deqa hukmê dadgehê de xwendin:

Reh û rîşeya vê terorê dibe ku di pêwendî û munasibetekê de bibînin, ku paş şoreşa Îslamiya Îranê form bi xwe ve girtiye, hewla Kurdan bi rêberatiya PDKÎ bo bidestveanîna otonomiyê, ew hizb kiriye hizbeke siyasî ya bihêz li dijî Komara Îslamî, ku di encamê de rêberê siyasî ê Îranê bi armanca serkuta PDKÎ biryar da ku li dijî vê hizbê, ne tenê bi awayê siyasî xebatê bike, lê niyeta jinavbirina fîzîk ya vê hizbê heye. Kuştina Dr Qasimlo û du hevalên wî li 13.07.1989`an û herwisa qetlek ku di vê dadgehê de lêkolîn li ser hate kirin, di encama vê siyasetê de ye, ku pêwendiya kuştara Birlîn û Viyenê gellek eşkere ye. Ew belgeyên haşahilnegir ku pêşkêşî dadgehê hatine kirin, şikl û şêweya biryardana lûtkeya rêberî ya siyasî ya Îranê, bi armanca jinavbirina dijberên rejîmê li derveyî welat gellek bi rohnî nîşan dide.

Biryardana li ser jinavbirinê, ji aliyê rejîmê ve, ew jî di navendekê de, bi navê encumena karûbarê taybet tê dayîn, ku organeke na yasayî ye, û bi biryara rêberê ayînî pêk tê, û endamên wê encumenê pêk tên ji: Serkomar, Wezîrê Îtila`at û emniyetê, Wezîrê Karê Derve yê welat, serokên nizamî û Întizamî û herwisa rêberê mezhebî yê hikûmeta Îranê. Ew kuştar tenê bi niyeta siyasî û bi armanca jinavbirina dijberên rejîmê bi rê ve çû. Armanca sereke ya rejîmê jinavbirina dijberan li derveyî welat e. Herwisa di vî hukmî de hikûmeta Îranê wekî hikûmeteke cinayetkar hate naskirin. Rejîma Koamara Îslamiya Îranê ji riya dewleta wê demê ya Alman û heta gefxwarina li dadwerê dadgehê, hemû hewla xwe da, ku aliyê kêm rejîmê bi tawanbar nehesibînin, lê dadwer bi tu awayî neçûne jêr barê gefxwarinan, û gellek bi cur`et ve, piştî çar salan lêkolînê, hukmê dadgehê ragehandin, hukmek ku ne dinyayê, û ne jî Komara Îslamî çavnihêriya wê nedikirin.

Piştî ragehandina vî hukmî welatên endam di YE de balyozên xwe bo heyamekê ji Tehranê vexwandin, û rewşeke gellek dijwar a siyasî bo rejîmê hate pêş, jiber ku Îran piştî van hemû terorên ku di derveyî welat de bi rê ve birin, bo yekem car ji aliyê dadgeha welatekî Ewropayî ve, wekî rejîmeke cinayetkar û terorîst hate naskirin.

Hemû ew cinayet û terorane, di lûtkeya deshilatê de pilandarêjî jê re hatibûn kirin. Her eva jî bû sedema vê ku Komara Îslamî êdî kiryarên terorîstî bi rê ve nebe. Dr. Şerefkendî xwediyê kesayetiyekî bilind ya mirovî bû, jiyana pirr ji êş û jan ya navbirî di dema zarokatiyê de, û xwendin û xwepêgehandina di bin siya birayê xwe de, û bi tab û tehemula zehmetiyên jiyanê, di gundeke biçûk a navçeya Bokanê, gihîşte pileya dukturayê di zanîngeheke Parîsê de. Eva alîkarê serekî yê kak Sadiq bona gihîştina bi vê pileya xwendinê bû. Herwisa bîra tîj û îradeya bihêz û piştqahîmiya bi zehmet û tekoşîna xwe, ji sedemên gihîştina navbirî bi vê astê bûn. Di Farsî de, û di Rojhilata Navîn de, bi van kesan tê gotin “xudsaxte”, ku ne serwet û samana malbatê, ne jî deshilatdariya bav û eşîret, tu yek ji wan di holê de nebûn, ku kak Sadiq pişta xwe pê girê bide, lewra bi neçarî pişt bi zehmet û tekoşîna xwe girê da.

Panoramaya jiyana wan kesayetiyan di gellek cihên vê cîhanê de balkêş in, û bandoreke kûr di civakê de hene. Rejîma Komara Îslamî jî, ji xwe re ew kesayetî nekirin armanc, ew bi başî şarezayê hêz û şiyan û jêhatîbûna Dr. Şerefkendî bûn, û nîgeran bûn ku tekoşîna sekreterê PDKÎ ku hizbeke bihêz a dijber e, dikare kêşeyeke mezin bo rejîmê pêk bîne, lewra biryara jinavbirina wî dan.

Kak Fetah Ebdulî şehîdekî din ji şehîdên Mîkonosê ye, ku navbirî ciwanekî pêgihîştî û endamê Komîteya Navendî û berpirsê ofîsa nûneratiya hizbê li Parîsê bû. Digel vê ku temenê wî kêm bû, lê jêhatîbûna xwe nîşan da, û hekî şehîd nebiba, bêguman di pêşerojê de wê roleke berçavtir hebûya.

Lê bi hemû wan pîlanan ve, ku rejîma Komara Îslamî û rejîmên din ên serberedayî û dijberê kurdên wan welatên ku Kurdistan bi ser wan de hatiye parvekirin, û bi hemû hêz û deshilata xwe, û pîlanên xwe, di terora rêberên tevgerên Kurd de dest hebûne, ne tenê her nekarîne Kurd bixin qedeman, heta bixwe di navxwe û di navçê de, berbirûyê dehan kirîzan bûne, û Kurd jî digel hemû kêşeyên ku beşa herî zaf ya wan, encama siyaseta serkutkerane ya wan rejîman e, lê niha di rewşeke baş ya siyasî de ye, bi taybetî rejîma Komara Îslamî ku jêve bû bi şehîdkirina Dr. Şerefkendî û Dr. Qasimlo dawî bi xebata mafxwazane ya Kurd tîne.

Niha ew rejîm digel dehan kirîzên navxweyî û derveyî berbirû ye. Xebata Kurd li Rojhilat jî herwisa berdewam e, û PDKÎ serbarê jidestçûna du sekreterên xwe, herwisa bihêz û şiyan ve li ser xebata xwe bi azadiyê berdewam e. Rejîma Komara Îslamî dibe bizane ku xebata Kurd li Rojhilat pirsa serkirdeyek û kesayetiyekî nine, ku bi jinavbirina xebata Kurd dawî pê bihê. Xebata Kurd li Rojhilat xebata neteweyeke mafxwarî û welat dagîrkirî û azadîkuj e, û heya wê demê ku zulm û stem li ser hebe, xebat jî wê berdewam be.
Îro beşek ji Kur distana parvekirî ku Başûr e, li hemberî ceribandinên dîrokî de ye. Pirsa referandomê li ser diyarîkirina çarenûsa xelkê vê beşê ye. Heya ku em nêzîktir dibin ji roja 25`ê Îlonê, ew pirs germtir dibe, û niha xelkê hemû besên Kurdistanê, bi

»»» Dom R:6

www.sivat.org

PDKÎ: Di 25.mîn salvegera şehîdên Mîkonosê de em digel rêbaza şehîdan peymanê nû dikin



Deftera Siyasî ya PDKÎ bi boneya 25.mîn salvegera şehîdên Mîkonosê daxûyaniyek weşand.

Deqa daxûyaniyê:

“Kurdistan serî natewîne”

Azadîxwazên Îranê!

Hevwelatiyên Kurdistanê!
Têkoşerên Demokrta!

25 salan berî niha di roja 26`ê Xermanan sala 1371 (17.09.1992)`an de, terorîstên rejîma Îranê, di nava dilê Eewropayê de, êrîşî ser heyeta PDKÎ kirin, û bi xelaya biyom ya xwe, wisa dizanîn ku wê bikarin serî bi Kurdistanê bidin tewandin.

Di vê karesata dîrokî de, destê reş ê terorê, Dr. Sadiq Şerefkendî sekreterê giştî û Fetah Ebdulî nûnerê PDKÎ li derve, û Homayon Erdelan nûnerê PDKÎ li Alman û Nûrî Dêhkordî dostê Kurd ji tevgera Kurd standin. Terorîstên şandî ji aliyê rejîmê ve, kerb û kîna xwe ya pendavbûyî ya sedan salî ya tarîperestî û dijîmirovî bi ser heyetekê de rijandin ku hatibûn da ku tevî beşdarî di kombûna cîhanî ya Înternasiyonala Sosyalîst di çend civînên din de hewlê bo pêkanîna yekîtiya di nava hêzên demokrat û azadîxwaz ên Îranê de bikin. Bi vê hêviyê ku sîvaneke hevbeş ya xebatê ji bo bidestvehatina demokrasiyê di Îranê de pêk bê.

Seranên rejîma dijîmirovî û serbere-dayî ya Îslamî li Tehranê ku dizanîn hewlên Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî dikare di nava rêxistinên demokrat ên Îranê de, pêgehekê ji xwe re bibîne, û pêgeha rejîmê lerzok bike, pîlana xwe ya terorîstî darêtin, û di vê şeva Birlînê de, û di restaorana Mîkonosê de, ku cihê civîna heyetan bo vegeşandina hêviyên azadiyê di Îranê de bû, rûniştina wir kirin armanca pîlana qirêj ya xwe, û tîma terorê ya rejîma Tehranê, civîn dane ber destrêjê, û bi taybetî teqe li heyeta PDKÎ kirin, û tîra xwe ya jehrîn li cendekê Dr. Sadiq Şerefkendî xistin.

Piştî vê terorê dezgeha Dadê ya Alman bi hewl û tekoşîna dadwer û parêzer û kesên mirovdost û dadperwer di pêvajoyeke çend sale de dosiye bi dawî anîn, û dadgeha Birlînê ku ji bo şopandina vê dosiyeyê bi dadgeha Mîkonosê nav derxist, rejîma Îranê li asta herî bilind de wekî biryarderê vê terorê da naskirin, û fermana destbiserkirinê ji wan re derkir.

Eva ku rejîma Îranê li pey wê bû, jinavbirina mêjiyê rêberiya xebatê di Kurdistanê û şikandina pişta hevgirtî ya xebata azadîxwaziyê di Îranê de bû, lewra jî Dr. Sadiq Şerefkendî bona jinavbirinê, destnîşan kiribû, da ku hem rêkxirawên Îranê ji jihevnêzîkbûnê poşman bikin, û hem jî serî bi Kurdistanê bide tewandin, lê pêvajoya bûyeran berevajiyê xwesteka rejîma Komara Îslamî çû pêş, û hem di asta navdewletî de, ew hikûmet wekî rejîmeke terorîst hate nasîn, û hem jî destê reş ê terorê di Ewropayê de kurt kirin.

Ji vê yekê jî girîngtir domandina xebata kurd li Kurdistana Îranê bû, ku herçend Dr. Sadiq Şerefkendî cihgirê Dr. Qasimlo bi ceste ji Kurdistanê hate standin, lê hizb û xebata wê hizbê, her li ser piyan man, û heval û hevçeperên Dr. Sadiq Şerefkendî û mamostayê wî Dr. Qasimlo, bi xebata xwe û bi hilgirtina barê giran ê xema jidestdana wan, û peymana emegdariyê, bi rê û şopa wan emegdar man û pîlanên Klomara Îslamî kirin bilqa ser avê.

Niha 25 salan piştî şehîdkirina Dr. şerefkendî Komara Îslamî herçend ku bi berçav dixwaze ku rûçikê hêzeke navçeyî ji xwe nîşan bide, û bi sala ye ku dixwaze bi navê îdeolojiya Îslamî, bîra xwe ya hişk û dogm bişîne derve, lê berevajiyê piropagendeyên vê rejîmê, niha xelkê navçeya Rojhilata Navîn Komara Îslamî wekî rejîmeke têkder didin nasîn, ku bi vegeşandina şerê mesebî û tundrewî, dixwaze ku kuştarê di herêmê de vegeşîne, û niha Komara Îslamî ne tenê bihêz nebûye, belkû di nava qufiyekê de ku bixwe çêkiriye de dest û piyan lê dide, û ew agirê ku bixwe pêxistiye, wê dereng yan zû damanê wê jî bigre.

Di navxwe ya welat de jî hekî 25 salan berî niha îdiaya “sazendêgî” (avedankirinê) û piştre jî îdiaya çaksaziyan dikir, niha serî heta binî, rejîma Îranê wekî çavkaniya hemû bêbextiyên jiyana xwe nas dikin, û hemû neteweyên Îranê bi giştî hatine ser vê baweriyê ku tenê riya jiyana baştir û reforman di Îranê de, nemana vê rejîmê ye.

Di eniya hember de jî, piştî 25 salan ku bi ser bûyera restorana Mîkonosê û şehîdkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî re derbaz dibe, em niha dibînin ku hizba Dr. Sadiq Şerefkendî di qonaxeke nû ya xebatê de, bi peyrewkirina waneyên wan rêberan dixwaze ku xebata çiya û bajar pêkve girê bide, û Rasana Rojhilat bûye rêbaza xebata îro. Her wekî ku Dr. Sadiq Şerefkendî digot, bo birêvebirina xebatê gellek rê hene. Rasana Rojhilat dixwaze ku hemû wan riyan veke, ku ji bo vegeşandina xebatê hewce ne.
Di biyaveke din de, hemû dizanin ku Dr. Sadiq Şerefkendiyê rêber, çende hez ji xebata neteweyî û vegeşîna xebatê di hemû beşên kurdistanê de dikir, û wê demê ku Kurdistana Başûr ezmûneke nû diceriband, Dr. Sadiq Şerefkendî palpişteke mezin bo xebata Başûr bû.

Xebatkarên Kurd di Kurdistana Îraqê de, hemû hogiriyên Dr. Sadiq Şerefkendî bo xebat û ezmûna wan, di bîra wan de ye. Niha di 25.emîn salvegera şehîdkirina Dr. Sadiq Şerefkendiyê rêber de em dibînin ku Kurdistana Başûr ber bi referandoma serxwebûnê ve pêngavan hildigre, û hêviyeke din ji hêviyên Dr. Sadiq Şerefkendî ser digre.

Xebatkartên Kurd!

Bi hemû wan rûpelên girîng ên dîrokê, û bi şiroveya niha ya navçe û Kurdistanê, û xebata Kurd, dema ku cardin em dikevin nava vê serdemê de, ku Komara Îslamî dixwaze bi terorkirina Dr. Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî û têkoşerên din ên Kurd, xebata neteweyî-demokratîk ya Kurd bixe qedeman, û Kurdistan di hember de serî bitewîne, rohntir ji hertim em têne ser vê baweriyê, ku xebata Kurd û tevgera neteweyî-demokratîk li Kurdistanê xebateke rewa û piştqahîm e bi bawerî û îradeya neteweyî, û em xatircem dibin, ku Kurdistan qet serî natewîne.

Di 25.emîn salvegera bibîranîna Dr. Se`îd, Kak Fetah Ebdulî, û Kak Humayon Erdelan de, em tevî peymannûkirina digel rêbaz û baweriyên wan, em silavan dişînin bo riha pak ya hemû şehîdên Kurdistanê.

Neman bo rejîma terorîstperwer a Komara Îslamî

Serkevtin bo xebata neteweyî-demokratî a Kurd

PDKÎ
Deftera Siyasî

26.06.1396
17.09.2017

www.akrivar.org

Ramana Dr. Qasimlo derheq pirsa serxwebûna Kurdistanê di dîrokê de







Cemal Resûl Dinxe

Qasimlo: “Hekî Erebistan piştevaniyê ji Kurd bike, Kurd dikare daxwaza mafê zêdetir ê xwe bike”. Renge bêjin ku gelo nasname (şunas, howiyet) çiye? Çi dibexşe me? Hebûna nasnamê çi tişteke jiyana me diguhere? Gelo bebûna nasnamê bandor li ser kesîtiya takekes heye?

Nasname wekî yek ji aliyên geşe û vegeşîna takekes di nava civakê de lê tê nihêrîn. Takekes di warê nasnameyê de hest bi hebûn, yan valahiya nasnameyê dike, û valahiya nasnamê curek ji zexta derûnî, û xwe bikêmzanînê bo takekes çê dike, ku di zanista civkansiyê de, dibêjnê “ji xwe bîhanîbûm”. Lewra gellek caran valahiya nasnamê bi yek ji qonaxên aloz û pirr ji metirsî, ên jiyana pêşkevtin û geşekirinê tê dîtin.
Derheq serxwebûn û herwisa bona gihîştona bi serxwebûnê neteweya Kurd heya niha jî xebateke bicoş bi rê ve dibe, û li ser gihîştina bi mafê xwe yê rewa bi hemû hêzekê pêdagirî dike. Nasname hêzeke me`inewî ji bo takekes ava dike, ku baweriyeke tewaw bi xwe û civakê çê dike. Hebûna nasnamê hêza derûnî û siyasî û kulturî dibexşe me, bi awayekî ku hêza hebûn û hêza me`inewî jî ji bo Kurdistaniyên beşên din tîne, û bingha me hemiyan bihêztir dike. Nemir Pêşewa Qazî Mihemed yekem car ku Komara Kurdistanê ava kir, bîra takê Kurd di hemî warên siyasî de vejiyand, û tenê di xebat bo gihîştina bi azadiyê de nehêla. Lewra jî piştî azadî û rizgariya neteweya xwe, piştî çend mehan, serxwebûna Kurdistan ragehand û yekem Komara Kurdistanê ava kir.

Dr. Qasimlo di heyama jiyana xwe de, komek gotar û gotûbêj encam dane, ku her yek ji wan bas ji bûyerekê kirine, û gellek caran jî pêşbîniya pêşeroj kiriye, û gellek dûrbîn bûye, û gellek ji axavtinên wî di piratîkê de ser girtine, yan jî ser digrin!!

Bo mînak hekî wê demê Dr. Qasimlo daxwaza otonomiyê dikir, piraniya rêberên siyasî ên Kurd ew daxwaza wî daxwazek kêm didîtin, lê Dr. Qasimlo bersiva wî ew bû ku “ carê em dikarin tenê daxwaza hindê bikin”.

Ji wê demê ve ku Kurdistana Başûr di heyama çend rojên din de piroseya referandomê ji bo sexwevûnê encam dide, û çendîn welat û bi taybetî welatên Erebî wekî Erebistan piştevaniyê jê dikin, Dr. Qasimlo di gotûbêjekê de, digel rojnamevanê Fransî Kirês Koçêra de, bas ji vê yekê dike, ku her demekê kêşeya Kurd wekî kêşeyeke siyasî bê naskirin, û Erebistan piştgiriyê jê bike, eva ezê diruşma stratejîk a Kurd biguherim.

Deqa gotûbêjê weha ye:

Kirîs Koçêra rojnamevanê navdar ê Fransî li ser otonomiyê, û sedemên neguherîna vê diruşmê di PDKÎ de ku diruşma stratejîk ya PDKÎ ye, weha dinivîse:
“Dr. Qasimlo di bersiva vê pirsyarê de weha dinivîse ku her demekê ew sê fakter amade bûn, ez dikarin diruşma stratejîk ya PDKÎ biguherim: 1-Tevgera neteweyî ya Kurd li her çar beşên kurdistaanê de, û bi taybetî di Bakûra Kurdistanê de bihêz be, jiber ku xebata Kurd di vê beşê de lawaz e.
2- Welatên navçeya Rojhilata Navîn piştevaniyê ji mafên rewa ên Kurd bikin, û kêşeya Kurd wekî kêşeyeke siyasî bê naskirin, û bi taybetî Erebistan piştevaniyê ji kêşeya Kurd bike, jiber ku Erebistan dostê stratejîk ê Amerîkayê ye di navçeyê de, û herwisa jê re girîng nine ku nirxa petrolê ser û xwar bike, û herwisa wî welatî kêşeyek bi navê kêşeya Kurd tune ye.
3-Welatên mezinhêz û Ewropî piştevaniyê ji kêşeya Kurd bikin, û her demekê ew sê fakter amade bûn, ezê diruşma stratejîk ya PDKÎ biguherim”.

Ew sê fakter niha ji hemû demekê zêdetir bo neteweya Kurd ciyê xwe digrin, lewra rêberên gelê Kurd bas ji vê dikin ku dem bi cî ye, û em ji daxwazên xwe paşekêş nakin.

Di vê derheqê de dibe dîsan em bînin bîra xwe, ku Qasimlo ew dîplomatê şoreşger, û siyasetmedarekî weha bû ku bi vî rengî pêşeroja neteweya Kurd dibînî.

Şandeke PDKÎ di vekirina nûneratiya HAK-PAR`ê de beşdarî kir



Di rêûresma vekirina nûneratiya HAK-PAR`ê de, ku li Hewlêrê pêk hat, şandeke PDKÎ beşdarî kir.

Roja Yekşemiyê 26`ê Xermananê şandeke PDKÎ bi serperestiya Mihemednezîf Qadirî endamê Deftera Siyasî a PDKÎ beşdarî di merasima vekirina nûneratiya HAK-PAR`ê de kir, ku yekem car e ew nûneratî di Hewlêrê de tê vekirin.

Şanda PDKÎ bi vê boneyê ve pîrozbahiya PDKÎ gehande HAK-PAR`ê, û pêdagirî li ser berdewamiya pêwendiyên dostane û alîkariya di navbera xwe de kirin.

Herwisa ew şand ji aliyê serokê HAK-PAR`ê Refîq Karakoç  û hevalên wî ve bi germî hate pêşwazîkirin, û piştre şandeke HAK-PAR`ê bi serokatiya Kemal Borkay kesayetiyên naskirî ê Bakûra Kurdistanê di merasima 25.mîn salvegera terorkirina Dr. Şerefkendî û hevalên wî de beşdarî kir, ku di binkeya Deftera Siyasî ya PDKÎ li Koyê de pêk hat.

Di merasima vekirina nûneratiya HAK-PAR`ê de, çendîn şandên cuda cuda ji partiyên her çar perçeyên Kurdistanê, û herwisa cihgirê parlementoya Herêma Kurdistanê û parlemantar û parêzgarê hewlêrê û dezgehên ragehandinan beşdar bûn.

»»»» Doma R:4

vê boneyê ve şahî û kêfxweşiyê dikin, wate bo rojekê ku sedsalek e xebatê jê re dikin.

PDKÎ mafê referandomê wekî mafê rewa yê xelkê dizane, ku yek ji bingehên demokrasiyê ye. Lewra piştgiriyê jê dike, û encama vê referandomê jî, ku dengê civatên xelkê Kurdistanê ye, rêzê jê re dadinê, û piştevaniyê jê dike. PDKÎ pilana dijminên kurd, bi taybetî ya Komara Îslamî jî ku roj bi rojê gefên tundtir li dijî referandomê dixwe, şermezar dike.

Em hêvîdar in ku xelkê Başûra Kurdistanê bi yekdengî di referandomê de başdariyê bikin, û deng bidin serbixweyiya welat. Bi vî awayî riha şehîdên riya rizgariya welat şa bikin, û pîlanên dijminan pûç bikin.

www.sirsiyakurd.org

Nerîna Lîderan



Peyama Barzanî bo gel: “Barê ser milê me girantir bû”!.



Yildirim: “Bila gumana ti kesî nebe, ku emê di mijara referandomê de tişta pêwîst bikin.”



Mûwefeq Rûbeyî: “Piştî giştpirsiyê, dê Kurdistana nû bibe cihê aloziya ewlekarî û aborî, herwiha bibe gefa li ser gelê Kurdistanê.”



Cîmz Cîfrî: “Kiryarên rejîma Îranê gellek metrsîdar in”.

PDKÎ: Piştevaniya ji serxwebûna Kurdistana Başûr, erkeke neteweyî ye



Deftera Siyasî ya PDKÎ bona piştevaniya ji serxwebûna Kurdistana Başûr daxûyaniyek weşand.

Deqa daxûyaniyê weha ye:

Piştgiriya ji serxwebûna Kurdistana Başûr, erkeke neteweyî ye

Hevwelatiyên rêzdar!
Neteweya mafxwaz a Kurd!

Biryara serkirdayetiya siyasî ya Herêma Kurdistanê bona birêvebirina referandomê di 25`ê Îlonê de, biryareke neteweyî, û pêdagirî ye li ser mafeke mirovî, û daxwazeke rewa ya Kurd e, ku dehan sal e di beşên cur bi cur ên Kurdistanê de, xebatê jê re dike, û dixwaze biryarê li ser çarenûsa xwe bide.
Hevdem digel demokratîkbûn û neteweyîbûn û rewayiya vî mafî, şêwaza desteberkirina wê jî, ku ji riya referandoma di Kurdistanê de bi dest tê, şêwazeke demokratîk û serdemiyane û aştîxwazane ye, ku nîşan ji geşekirin û hişyariya siyasî û neteweyî ya Kurd û xelkê Kurdistên ye, ku di navçeyeke tejî ji teror û reşekujî û bîra paşvemayî û dugm de, bîreke serdemiyane û demokratîk heye, ku bi mîkanîzma demokrtîk û pêşkevtî dixwaze mafên xwe bi dest bîne, û îradeya neteweyî û demokratîk a xwe biselimîne.

Rêûresma bîranîna xebat û tekoşîna Dr. Şerefkendî di navenda 3 de bi rê ve çû





Bi beşdariya kadr û pêşmerge û endamên PDKÎ û nûnerên çend aliyên siyasî û çend kesayetiyên Kurdistanî, rêûresma rêzgirtina ji xebat û tekoşîna bêravestiyan a şehîd Dr. Şerefkendî û hevalên wî, bi xwendina sirûda Ey Reqîb û ragirtina deqeyekê bêdengî bona rêzgirtin ji riha pak ya şehîdan, di navenda 3 a Kurdistanê de bi rê ve çû.

Piştre peyama Deftera Siyasî ya PDKÎ bi vê boneyê ve ji aliyê Teymûr Mistefayî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ pêşkêşî beşdarbûyiyan hate kirin, ku tê de tevî awrîdanek li cinayeta Mîkonosê, baseke têr û tejî li ser kesayetiya bilind ya Dr. Şerefkendî kir.

Naveroka vê merasimê jî pêk hatibû ji xwendina peyama hevpar ya yekîtiyên jinan, ciwanan, û xwendekaran, ji aliyê Şaho Ehmedî berpirsê komîteya Lawan li navenda 3 a Kurdistanê, û xwendina sirûdeke şoreşgerî ji aliyê keç û kurên Navenda 3 a kurdistanê, û pexşanek ji aliyê Mamosta Bêbeş ve. Hêjayî basê ye ku ew kesayteî û aliyane jî, di merasimê de beşdar bûn:

-Birêz Mêhdî Zana kesayetiyê naskirî ê Bakûra Kurdistanê û hevjînê xebatkara navdar Leyla Zana

-Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurdistana Sûriyê

-Partiya Sosyalîst a Kurdistana Sûriyê Partiya Sosyalîst a Kurdistana Bakûr

Me di PDKÎ de hem pêştir bi awayekî fermî ragehandiye ku ew maf mafekî rewa yê Kurd e di Kurdistana Başûr de, û hem jî bi awayekî cidî em piştevaniyê ji referandomê ji bo serxwebûna Kurdistana Başûr dikin, û di vir de tevî dubarekirina vê piştevaniyê, em rû li gelê Kurd li Rojhilata Kurdistanê wekî beşeke belengaz, lê hişyar û hestiyar, û xwedîbiryar dikin ku: Yekem- Di van rojan de heya roja birêveçûna referandomê bi her awayekî ku hûn dikarin piştevaniya xwe ji referandomê bo serxwebûna Kurdistana Başûr nîşan bidin, û di roja encamdayîna referandomê de jî, bi bilindkirina alaya Kurdistanê û lixwekirina kincên Kurdî, û amadebûna li cihê giştî bi van kinc û alayan, nîşan bidin ku neteweya Kurd di hemû beşên kurdistanê de piştevan û hevsozê hev in.
Duyem-Hemû endam û alîgrên PDKÎ li derveyî welat, û li Başûra Kurdistanê bi her awayekî ku ji destê wan tê, di mîtîngên ku ji bo piştevaniya ji referandoma serxwebûna Kurdistana Başûr pêk tên de, amadebûneke berçav hebin, û bi hilgirtina diruşmên pêwendîdar, alîkar bin bona zêdekirina piştgiriyan.

Sêyem- Bi rêxistina kempeynên taybet di torên civakî de, û bi piropagendeyeke taybet bi vî warî, wajoyên piştevaniyê ji bo serxwebûna Kurdistana Başûr kom bikin, û di vê derheqê de jî, rola xwe bo handana xelkê bilîzin, û alîkar bin bona gihîştina neteweya Kurd di beşeke nîştiman de bi mafên xwe ên rewa. Siyaset û baweriya PDKÎ her di destpêka avakirinê wê de, û ji bingehdanîna Komara Kurdistanê ve heya niha, ew bûye û niha jî ew e ku kurd wekî yek netewe dibîne, ku bi bê hezkirina wê, xaka wê bi ser çar welatan de hatiye parvekirin, û vegeşîna xebata kurd di her beşekê de, bi serkevtin û deskevta hemû Kurd dizane, û xebata Kurd di Başûr û li Rojhilat dikarin û dibe ku piştevanê hev bin bona hindî zêdetir vegeşîn û lihevnêzîkbûnê, bona guhîştina bi hêviyên neteweyî û demokratîk. Referandona ji bo serxwebûna Kurdistana Başûr, vejiyandina Komara kurdisatnê ye.

PDKÎ Deftera Siyasî
25.06.1396
16.09.2017

www.arsivakurd.org

Çend wêne ji rêûresma 25.mîn salvegera terorkirina Dr. Şerefkendî û hevalên wî

















»»»» Doma nûçeya manşêtê

Bi beşdariya xelkekî berçav û hejmarek ji mêhvanan karnevala piştevaniya ji serxwebûna Kuirdistanê di Navenda 3 ya Kurdistanê de bi peymannûkirina digel rêbaza şehîdan bi dawî hat.

Ew karneval bi beşdariya endamên rêberî ya PDKÎ, kadr û pêşmerge û malbatên wan, û hunermendên navdar ên Kurdistanê û hizb û aliyên siyasî ên Kurdistanê bi dawî hat. Ew karneval ji aliyê PDKÎ ve hatibû rêkxistin.

Destpêka vê karnevalê bi sirûda neteweyî ya Ey Reqîb û ragirtina deqeyekê bêdengî bo rêzgirtina ji riha pak ya şehîdên Kurd û Kurdistanê dest pê kir. Piştre Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ çend gotinek pêşkêş kirin, û piştevaniya PDKÎ ji serxwebûna Kurdistanê ragehand. Piştre hunermendê navdar ê Kurd Şivanperwer çend gotinek li ser serxwebûnê kirin.

Piştre mamosta Bêbeş parçe helbestek li ser serxwebûna Kurdistanê pêşkêşî beşdarbûyiyên kernevalê kir. Piştre "Koma serxwebûn" girûpa muzîka Rojavaya Kurdistanê bi serperestiya hunermend Ehmed Ekaş çend perçe muzîk li ser referandomê pêşkêş kirin. Birêz Gulbax Behramî jî di vê karnevalê de perçe helbestek pêşkêş kir. Hunermend Birader jî bi çend sirûdên şoreşgerî merasim xemiland.
Herwisa zarokên Navenda Nêrgiz jî di vê karnevalê de stranek li jêr navê "Berî beyan e" pêşkêşî beşdarbûyiyan kirin.

Karneval bi govend û dîlana girûpa "TISHK" a ser bi Komîsyona perwerdehiya PDKÎ bi dawî hat.

Herwisa çendîn hizb û aliyên siyasî jî peyamên xwe bo vê karnevalê şandin, ku ew aliyên siyasî bûn:

-Liqa 16 ya PDK`ê
-Birêveberiya Asayişa Behrekê
-Birêveberiya Nahiyeya Behrekê
-HDP
-PDK-T
-HAK-PAR
-PYD
-PDKS
-PSK
-Malbatên şehîdên Qereseqel û Kosalan
-Peyama Hêza Taybet ya PDKÎ



















www.arsiv.kurd.org

Ehmedê Xanî û dewleta Kurdî

Besam Mistefa

Xewn û daxwaza dewleteke kurdî kevn e. Ronakbîr û helbestvanên Kurd berî sedan sal girîngiya dewletê û pêwistiya hebûna wê ji miletê xwe re diyar kirin û di nav dîwan û berhemên xwe yên edebî de bicih kirin.

Bi taybetî Helbestvan û fîlosofê Kurd yê neteweyî Ehmedê Xanî berî nêzîka 400 salî, behsa dewleta kurdî kir û bi awayekî eşkere û vekirî pêdiviya dewletê ji gelê Kurd re anî ziman.

Helbestvan û zanyarê Kurd yê mezin, kurdperwerê bêhempa Ehmedê Xanî dabû pêşiya dema xwe û berî belavbûna bîr û baweriyên netewperwerî û dirustbûna dewletên neteweyî, ji gelê xwe wateya dewletbûnê bilêv kir û xwest ku Kurd şiyar bibin û hizr û ramanên neteweyî û evîna welat û nîştimanperweriyê di nav wan de belav bibe.

Dema Kurdistan ji bo cara yekem bi riya Peymana Qesra Şîrîn hat parçekirin, Xanî ew peyman şiband tarîbûna roja Kurdan û bi peyvên watedar derd û hawara Kurdistanê wiha vegot: “Tasek ji vê ava zelal, nadim bi hewza kewserê. Levhatina Qesra Şîrîn, jê nabînim tu meferê. Piştî roja me bû tarî, mirin xweş e ji emberê.”

Di demekê de ku hê jî fikir û ramanên neteweyî li dinyayê baş zelal û belav nebûbûn, Xaniyê mezin û bîrbir pêşbînî kir wê Kurd ji ber nebûna dewleta xwe ya serbixwe çi êş û zehmetiyan bikişînin. Bi taybetî bi hebûna dijmin û neyarên pir li çarmedor û nebûna yekîtî û tifaqê di nav Kurdan bi xwe de.

Xanî tifaq û yekîtiya gelê Kurd dike mercê sereke yê avabûna dewleta serbixwe ya kurdî û wiha dibêje: “Lew pêk ve hemîşe bêtifaq in. Daim bi temerrud û şiqaq in. Ger dê hebûya me ittifaqek. Vêk ra bikira me inqiyadek. Rûm û ereb û ecem temamî. Hemiyan ji me ra dikir xulamî. Tekmîl dikir me dîn û dewlet. Tehsîl dikir me ilm û hikmet.”

Xanî destana xwe ya nemir Mem û Zîn jî kir behaneyek da tê de fikir û hizrên xwe yên neteweyî bîne zimên. Armanca wî ew e ku Kurdan ji tamara xewê rake û berê wan bide rizgarî, serxwebûn û ronahiyê. Zîn sembola heyvê, azadî û Kurdistanê ye. Mem gelê Kurd e û Zînê di roja Newrozê de nas dike. Mem dixwaze bigihe Zînê, ango Kurd dixwain bigihin azadiyê, dixwazin bigihin Kurdistanê.

Xanî dibêje: “Şerha xemê dil bikim fesane. Zînê û Memê bikim behane. Nexme we ji perdeyê derînim. Zînê û Memê ji nû ve vejînim.”





Ji Yilmaz Ayan klîpa referandomê



Hunermendê ji Bakûrê Kurdistanê Yilmaz Ayan, ji bo piştgiriya referandoma serxwebûna Başûrê Kurdistanê klîpa “Belê bo referandoma Kurdistanê” amade kir.

Her ku dema referandoma Başûrê Kurdistanê nêzîk dibe, piştgiriya ji bo serxwebûna Kurdistanê jî mezintir dibe. Hunermend, rewşenbîr û siyasetmedarên her çar parçeyên Kurdistanê banga “erê” ji bo referandomê dikin.

Hunermendê ji Bakûrê Kurdistanê Yilmez Ayan jî strana xwe ya bi navê “Belê bo referandoma Kurdistanê” kire klîp.

Derbarê vê karê xwe yê nû de hunermend Yilmaz Ayan ji Rûdawê re ragihand: “Serxwebûn xewna hemû kurdan e û xewneke hezar salî ye. Bi vê referandomê Kurd di dîroka xwe de yekemîn car e ev hinde nêzîkî serxwebûn û azadiyê bûne.”

Yilmaz Ayan bal kişande ser giringiya piştgiriya her aliyekî ya ji bo referandomê û got: “Referandoma Başûrê Kurdistanê pêvajoyeke pir giring e ji bo hemû beşên Kurdistanê. Kilîla gihiştina mafên xwe ye ji bo gelê kurd. Lewma divê kurdên li hemû cîhanê piştgiriya referandomê bikin.”



Hunermendê kurd diyar kir, ku giring e hunermend jî weke pêşengên civakê ji bo vê pêvajoya dîrokî erk û berpirsiyariya xwe bicîh bînin û wiha axivî:

“Weke hunermendekî ji bo piştgirî û bangaşeya vê pêngava dîrokî, min jî ev klîp amade kir. Em bi dil û can ji bo referandoma serxwebûna Başûrê Kurdistanê dibêjin belê.”

Peyvên vê stranê yên helbestvan Mihemed Oreyî ne û awaz yê Yilmaz Ayan e. Herwih di stranê de hunermend Aynûrxan jî vokalîstiyê dike.

Strana “Belê bo referandoma Kurdistanê” di stûdyoya Çar Lorîn a Hewlêrê de hatiye tomarkirin. Rudaw

www.arsivakurd.org

Zimanê Kurdî

Doma diyaloga hejmara pêşîn:

Baran: Bi rastî di dilê min de jî ew der hebû. Min bêriya masiyan kiriye!

Garson: Kerem kin, hûn bi xêr hatin. Ez ji we re çi bînim?
Dilcan: Zeleteyeke xweş û hinek masî, lê bila xweş were biraştin, xav nebe û aveke sar.
Garson: li ser her du çavên min. Hûn çi dixwazin?
Baran: Ji min re jî heman tiştî bîne; zelete, masî û av.
Garson: Ser çavan. Wekî din daxwazeke we heye?
Dilcan: Na, ka bila ev werin, emê binêrin.
Baran: Erê. Dilcan ka li paş xwe binêre, ew ne Zozan û Sînem in, rûniştine?
Dilcan: Belê, wele ew in. Min ji mêj ve ew nedîtine. Ka heta xwarin tê, em silavekê bidin wan.
Baran: Dibe. Min jî ew ji mêj ve nedîtine.
Dilcan: Silav ji we re keçikino. Hûn çi dikin li vir?
Zozan: Wîî, tu û van deran?
Sînem: Silava we li ser çavan. Hûn ji ku derketin lê?
Dilcan: Me got, em herin li ber avê xwarinekê bixwin. Me nizanîbû keçikên xweşik tev li vir kom dibin.
Baran: Te tam li hedefê da wele. Îşev her kes bi awayekî ji her dem xweşiktir bûye. Xêr e înşalah.
Zozan: De tu jî Baran, bi wê dilxweşkirina te, te Dilcan ji me veqetand û ji xwe re bir. Êdî em nema wê dibînin.
Baran: Na wele, Dilcan ji xwe keçika herî xweşik a vî welatî ye, ew ne sûcê min e.
Sînem: Û em?
Baran: Hûn jî ne kêmî wê ne!
Zozan: Axx, axx, ev zimanê te bila hinekî di devê Siloyî de jî heba, ma wê qiyamet rabiba!
Peyvên tu wateya wan nizanî li jêrê binivîse:

Van pirsan ji hevalê xwe/ji hevala xwe bipirse û bersivan li vir binivîse:
Çima mirov li ber hev xweş dikin? .....
.....
.....
.....
Aliyên baş û yên xerab yên xweşbêjiyê ango xweşkirina li ber hev çi ne? .....
.....
.....
.....
Tu ji xweşbêjiyê hez dikî ango bi xwe xweşbêjek î? .....
.....
.....
.....
Gelo xweşbêjî hunerek e, yan mirov dikare fêr bibe? .....
.....
.....
.....
Tu dixwazî ku hevalê te/hevala te li ber te xweş bike? .....
.....
.....
.....

Tiştonek



A: Mahir Berwarî

- Sê candara bi hevra sê ser, şeş çav û du ling hene.
Bersiv: (* masî, mar, kew)

- Mela û jina xwe, qeşe û jina xwe, mamosta û jina xwe
divên li rûbarî bi gemiyê ku bê xwediye û tenê du kesan
digire derbaz bibin. Vana teva bawerî bi hevdu nîne û
dilxirabin. Gelo çawa ev hemû bê alozî dê derbaz bibin?
Bersiv: (* Her sê jin bi du caran derbaz dibin. Jina Mamostay
vedigere û gemiyê di înit. Qeşe û mela bi gemiyê derbaz dibin. Mala û jina melay vedigerne ve. Mela û mamosta jinên xwe dihêlin û
derbaz dibin. Jina qeşey bi du caran herdu jinên dî derbaz dikit.)

- Mirovekî gurek, mihek û cihalekê cihî hebû, dixwest li
rûbarî derbaz bibit, gemiyek hebû xwedî û tiştek ji wan
bi tinê digirt.Gelo ew zelam dê çawa xwe û tiştên xwe
derbaz kit bêy ku hevdu bixûn?
Bersiv: (* Zelam bo cara êkê dê mihê derbaz ket, gurg û cih li wir
dihêlit. Paşî vedigere gurgî dibe û mihê li gel xwe vedigerîne ve. Vê carê mihê li wêrê dihêlit cihî dibe li gel xwe. Cara dawî vedigere
mihê jî bi xwe ra dibe. Bi vî rengî hemuyan derbaz dikit.)

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin

www.arsivakurd.org

Agirî



Dr. Sharafkandi

www.arsivakurd.org